**Terorîzm nasnameya rejîma Axûndî di Îranê de** »»» R:7



**Kê bi şer û malvêraniya Hema û Xezê keyfxweşe û geheşte armanca xwe?** »»» R:2

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (457) 11-08-2023Buha (1000) Tûmen*

**Apartaîda zimanî li Îranê** »»» R:4

**Şerê Xezeyê: Hamas yekem, Hizbullah dûyem** »»» R:8

## Bo çi Tehran bêdeng e?

Dema ku em mêzeyî bûyerên nava welat û wan cinayetên ku ji aliyê rejîmê ve têne kirin dikin, li rastî de mirov dimîne heyrî ku çima bertek nayê xûyakirin? Çim xelk li hember zilm û zordariya rejîma dictator de bê deng e?

Dema em dibêjin bêdeng renge mebest hemî xelkê Îranê û netewên bê maf nebe, belkû armanc xelkê navenda Îranê û bitaybetî xelkê tehrana 20 Milyon kesî ye. Hekî ne netewên blindest û bitaybet ji wan Kurd û Belûç hertim xwedî helwêsin û aliyê kêm niha jî dengê şoreş û mafxwazî û tevgêrê li wan herêman de bilind e û her ewaye jî ku rejîma dictator bi hemî hêza xwe dixwaze wî dengî bifetisîne û bo geheştina bi vê armancê jî, Kurdistan û Belûçistan weke padiganekî leşkerî militarize kirine. Li rastî de tenê ev 2 netewane ne ku li hember rejîmê de rawestiyane û bûne cihê hivya hemî azadîxwazan û lewmaye jî ku rejîm jê ditirse û hisabê li ser dike.

Lê mijara serekî ku bo me û renge bo hemî mirovekî azadîxwaz bibe cihê pirsyarê eve ku, li demekê de ku rojane dehan cinayet li Tehran û hin bajarên dine yê navenda Îranê de ji aliyê rejîma dijî mirov ve têne afirandin, xelk bê helwêst û bê deng e?

Bi bavera me gerçî li şoreşa “Jin, Jiyan, Azadî” de li wan bajarên mezine navenda Îranê û li Tehranê xelk beşdar bû û yekitiyekî seranserî li her derê Îranê de bi dijî rejîmê çêbû, piştî derbasbûna salekê bi ser vê şoreşê de, niha xuya dibe ku tenê bandora Kurdistanê bû li ser wan û hesta wan jî bizivî û ewan jî serhildanê de beşdarî kirin. Gelek nekêşa ku şoreş li Tehranê tenê bi diruşmdana li ber pencerên apartumanan hate dîtin, ev gotine jî bi wê manayê nine ku em bixwazin rol û hesta wan berçav negirin, renge bivêriya wan hevqasê Kurd û Belûçan û netewên dine nebe, renge vê yekê jî bandor hebe ku ev hertim li jiyanekî xweş û dûr ji asimîlasyon û bêpariya li imtiyazên hikûmetî de jiyane û ne çand û ziman û nasnameya wan qedexe ye, ne jî deshilat û rejîm wan ji xwe bîhanî dizane.

Lê ev sedemane hêcet ku dev ji xwedî derkevtin ji kerameta xwe, jin û keçên xwe, azadî û mafê miroviye xwe xwedî derkevin. Li Tehrana 20 milyon kesî de, rejîm rojane hetka dehan keç û jinan bi hêceta neparastina hicabê dişkêne, hunermendê bi navûdenge Sînemayê û



hevjîna xwe têne hincî hincîkirin, jinên sernas û xebatkare weke Nesrîn Sitûde têne girtin, bê karî, bihatî, birsîtî û dehan diyardeyên dine ye civakî li Tehranê û bajarên navenda Îranê jî bêdadiyê dikin, bi wî halî çima dibe bê deng û bê helwês bin?

Gelo rejîmê ev çavtirsandî kirine? Gelo ev xwe parej ji rejîmê dizanin? Gelo ev bi hegera ewê ku xwe netewa serdest dizanin, naxwazin li gel netewên bê maf hevdeng bin? Gelo ev kevtine bin bandora pirûpagenda rejîmê yak u dibêje renge piştî têkçuna komara Îslamî, Îran jî weke Sûriye û Yemen û Lîbiyê lêbe?

Ewan pirsyarane tenê bersivek heye ku ev jî ewaye: Rejîm baş haydarê bê helwesî û nebûna hişmendiya şoreşvanî yaw î xelkî bûye, û gelek baş li ser naveroka wan pirsyarên serve kar dike, lê heya ev xeke bivêr û xwedî helwest nebe, dê şikandina keramet û hetka wî xelkî jî ji aliyê rejîmê ve berdewam be.

# Kê bi şer û malvêraniya Hema û Xezê keyfxweşe û geheşte armanca xwe?





**N: Nûredîn Sofîzade**

Ezê bi vê pirsyarê bêxme ber raya we xwendevanên hêja, ku di demekê de Xelkê Xezê şev û roj di bin bombe û agir û asin û barûtê de ne û xwîn live dibare û mezintirîn malvêranî bi serê wan de hatiye, Zarokên Xezê birsî û têni û derbiderin, tirajîdiyayek ku wîjdana mirovatiyê dihejînê, erê gelo kê û bi çi armancekê ev yêke bi ser xelkê Xezê de anî?

Renge hinek kes di bersiva wê pirsyarê de bi lez bibêjin ma kê heye nezane ku sebebkar ku ev malvêraniya hatî serê xelkê Xezê, Hemas e. Lê renge cihabekî sava û sade û sanahî û berçav ev beî, lê bo peyda kirina bersiva rastîn dive em hinekê bi hûrî aliyên cudaye wê pirsê binêrin û ez hivîdarim ku bikarim di vê nivîsê de bersiva hewce zelal bikim.

Herwekî her kesek dizane rejîma terorîstperwere Îslamî a Îranê make û avakerê terorîsma navdewletiye û bi armanca berfirehtirkirina îdolojiya xwe a paremayî û ku bikare pelan bihavêje her derê cîhanê û bitaybetî nawça Rojhilata navîn, dehan girûpên tundajo li welatên cuda cuda de çêkirine û li demekê de ku xelkê Îranê birsî û bêkarin, rejîm bi serwet û dahata xelkê Îranê wan girûpan têr û teyar û çekdar dike.
Rejîma Îranê heçî dema ku xwastibe ev girûp ji bona armancên xwe bikar anîne û şerxazî û pîlanên xwe û bitaybet alozî çêkirin û şer û tevdanî û nehêminkirin bi wan girûpan daye kirin.

Bo peydakirina bersiva pirsyara xwe, ku kê ev malvêranî bi serê xelkê Xezê de anî, her ev hinde bese ku em bala xwe bidne sardana Îsmaîl Heniye serokê Hemasê 2 caran tenên li heyama wî şerî de.

Gelek bi zelalî xûyaye ku Hemasê ev şere bi fermana rejîma Îranê û Xamineyî destpê kir û piştre û ji tires egera derba Îsraîl û Amerîka re, xwe jê nekire xwedî û sardana Heniye jî bo Îranê vedigere bo ser gazinde û hevar birin bo hatina îranê bi alîkarî yan piştgîriyê.

Hemî welatên erebî gelek baş dizanin ku rejîma Îranê ev yêke bi Hemasê da kirin, lewma ti yek ji welatên Ereban ne tenê piştewanî ji Hemasê nekirin, belkî awayê êrîş û cinayetên Hemasê birne jê rexnê û tenê ewa ku heta niha wek helwêsta Ereban xûya bûye, daxwaza ragirtina şer dikin.
Başe Armanca weşartiye rejîma Îranê çi bû?

1– Bala raya giştî a cîhanê bo ser wî şerî bikêşe û buyer û cinayetên xwe li nava Îranê de perdepoş bike û ji bîra xelkê û mediayan bibe.
2 – Xwast Hemasê bikar bîne û jêvebû ku dê bikare wekî xwediyê Hemasê û li role naybençî de, bo guherîn û berdana êxsîrên ku Hemasê li Îsraîl girtibûn û biribûn, di gel Îsraîl û Amerîka bikeve danûstandinê û di vê navberê de box we jî û bi armanca kêmkirina givaşan li ser xwe, çûr û imtiyazan vergire.

3 – Têkdana pêvajoya asayîkirina peywendiya Îsraîl û welatên Erebî.
4 – Bêje Amerîka û Rojava ku ez hinde bihêzim ku mudîriyeta nawça Rojhilata Nawîn li destê min de ye û çi tiştek bi bê hez û rizamendiya min ser nagire û nikarin hisabê li ser min nekin.

5 – Hisaba xwe wisa danabû ku ger Îsraîl bersiva Hemasê bide û dest bihavêje êrîşê, hekî welatên Erebî jî pişta Hemasê negirin, aliyê kêm dê dê girûp û milîsên girêdayî bi rejîma Îranê ku nanê hemiyan li ser sifrika xelkê Îranê ye, dê pişta Hemasê bigrin û hinge Îsraîl jî dê ji tirsan de zû şer ravestîne û teslîm be hinge rejîma Îranê weke xwediyê wan girûpan dê xwe serkevtî û Îsraîl jî şikestxwarî bide zanîn.

6 – Rejîma Îranê ku li ser îdolojiya meshebiye Şîeî 12 Îmamî hatiye avakirin û nivya heşemeta Suniye nava Îranê jî qebûl nine û ji heçî mafekî bêpar kirine, Hemas jî ku li ser bavera Olê Suniye, bo rejîma Îranê re xemekî mezin nebû ku hekî bi temamî jî ji nav biçe û bibe qurbanî û xelkê Xezê jî ku Sunî ne, hemî bêne kuştin û bajar û male wan bêne kavilkirin jî, ne tenê nabe cihê nerehetî û xema rejîmê û rêberê vê, belku bi destê Îsraîl karek kiriye ku hebxwe li nava Îranê de digel Suniyan dike, Mînak jî kuştara Belûçan, fermana cîhadê bi dijî Kurdan, girtin û sêdaredana bavermend û mamostayên Sunî, îzn neda bi çêkirina Mizgevtekê li Tehrana 20 milyon kesî de bo Suniyan û gelek mijarên din.

Bê guman ne tenê rejîma Îranê xema Xezê û Hemasê de nine, belku gelek jî ser dilê wane.
Rejîma Komara Îslamî ewa ku îro anînî ser Hemas û Xezê de ku jiyan û heyî û neyî a wan têde birin û wîn dibare, rast bi pîlan û çêkirina Girûpa terorîstiye Daîş ê ev yêk anîne ser xelkê nawşên Sunî li Îraqê de jî û jiyana wan bo dehan salan paste zivirandin û rejîma Îranê tola şerê 8 saleye Îran û Îraqê û Sedam Husyên li xelkê Mûsilê û Suniyan vekirin.

Ewa ku îro rejîma Îranê û Xamineyî anîne ser Hemasê, tola vê hindê ye ku dema xelkê Sûriyê bi dijî malbat û deshilata Esedê dictator serhildan kirin, Îran û Qasim Silêmanî vê demê daxwaz ji Hemas û Hizbullahê kirin ku bona parastina hikûmeta Beşar Eset ji sernixûniyê biçne Sûriyê, Tenê Hemas bû ku amade nebû li ser daxwaza Îranê wî karî bike.

Deshilatdarên rejîmê gerçi îro rondikên heram û direvîn bo Xezê û Hemasê dibarînin, lê di rastî de nikarin keyfxweşiya xwe veşêrin.
Di encamê de dibe bêjim ku aliyê kêm ev pîlan û direvên rejîma Îranê bo xelkê Xezê û hemî girûpên girêdayî bi Îranê re xûya bûye û hayîl naveroka direvîne wê bûne û dizanin ku rejîma Îranê gerçî alîkariya wan kiriye, bo disozî û xema wan de nebûye, belkî ev bikar anîne tenê bo armanc û pîlanê qirêje xwe û şerê Xezê ev ji xeflet û xewa giran hişyar kirin.

# Çavê dera, xweliya sera



**N: Rostem Cehangîrî**

Hemû leyek kêm û zêde li ser şerê Ereb û Îsraîlê dizanin, nêzî heştê salan e ku ew du neteweye bi bidestxistina zêdetir bandorê bi ser ewê din bike heye, livê xerîta Rojhilata nawîn de du Netewên sereke weke Cihû û Ereb dijîn, bilî wan jî hinek Olên din jî li wê xerîtê de dijîn.

Lê mesala eslî ewe ku şerê du netewan e li ser axê, herwek dizanin ew şerê hanê nêzîkî heştê (80) salane didome, sala 1967an ku leşkerê Îraq û Sûrîyê û Ordonê li ser daxwaza bi hevara welatê misrê ku Cemal Ebdulnasir serukê wê demê yê welatê Misrê bû çon, lê ewane hemû pêkwe di şerê ligel Îsraîl de şikan, şikanek ku hisyeta Eraban şika, ya ku bi kurdî dibêjin: hetka Ereban nema, hemiyan nekarîne welatê teze pêkhatî ye Îsraîl .

Ev şere bi şerê şeş roje hate binav kirin ku hemû Ereb têdabûn û dîsan li heyamê şeş rojan de têk çon, li wî serdemî de Rêkxistana Netewên Yêkgirtî bo çaresera kirîza navbera Ereb û Îsraîl, qirar istand ku du dewelt pêk bên, bo herduk netewan. Anku bo Îsraîl û Felistînê, lê mixabin wî serdemî de dewletên Ereban û Rêxstina Azadîxaze Felistînê ew yêke qebûl nekirin, ragehandin ku ew axa axekî miqedese tewî ti aliyekê parve nakin. Bixasmanî bi Cihû yan re hernakin. Bo agahiyên xandevanên Agirî dewleta Îsraîl wê demê ew qirara Rêkxirava Netewên yêkgirtî qebûl kir, lê herwk li serê amaje pê hat kirin, welatên Erban ewe nepejirandin, Îsraîl bi ser Erban û bixasmanî bi ser felistîniyan de serkevt, li şerde dest biser piraniya axa ku Felistînî têde nîştecî bûn girt, bi hezeran Felistînî aware û derbiderê welatên Erbî û dunya yê bûn, îdî şansê pêkhatina dewleta Felistînî bi tewahî ji nav ço.

Slaên 90an de dewleta Îsraîl bi hevlekî çareserî bi Rêkxistana azadîxaze felistînê re ketine diyalogê, gehiştine çareseriyeke baş, qirara aştîyê li jêr çavedêriya dewleta Amerîkayê, li Kempdêywîdê li cem herduk serokên Îsraîl bi navê Îshaq rabîn û Yasir Erefatê serukê Felistîniyan ve hat Îmzakirin, herduk aliyan li ser du dewletan bo wê dewerê anku bo gelê Îsraîl û Felistîniyan rêkevtin. Ji alyê dewleta Îsraîlî ve hemû şar û gondên ku Erbên Felistînî ve hatibûne çol kirin, radestî Rêxistina Azadîxaz kirin, idî ev hiviye hebû ku bikarin bigehne çareserîa giştî.

Ev yêka ji aliyê dunyayê ve bi germî hat pêşvazî kirin, xelata Nobelê seba wê aştiyê pêşkêşî serokê Felistînê Yasir Erefat û serokê Îsraîlê Îshaq Rabîn kirin, tewî hemû wan guhertinkariyan li bizawva aştîyê de, mixabin li herduk aliyan tûndajoyan ev yêke qebol nekirin, li Îsraîlê tûndajoyekê, serokê welat ku îmzakerê wê aştîyê bû, anku îshaq Rabîn teror Kirin, û li vê demê ve idî îdara dewleta Îsraîl kevte destê tûndajoyan û diyar bû çareserî idî dê bizehmet be.

Aliyê Felistînîyan jî her wesa bû, destê derekî keten ava wan û xwasta ji navbirina Îsraîl û gelê Îsralî zêde bû, hinek welatên Erebî ev yêke qebûl nekirin, lê yaherî girîng ewe bû ku destê rejîma komara Îslamî a Îranê kevte nava Felistîniyan. Cuda bûn û şeq bûn kevte nava wî gelê bindest û belengaz de, girûpên Îslamî weke Hamas û Cîhada Îslamî bi piştewaniya komara Îslamî çê bûn, rewşa wî gelê belalêdayî roj tewî rojê berbi xirabiyê ve ço. kar gihîşte wê astê ku bi fîtna Îranê şerê nawxoiy li nava Felistîniyan de çê bo. Sîstima du îdarî li nava Felistînê çê bo, Xeze bitewhî kevte destê girûpên Îslamî bixasmanî Hemasê. Îdara dine jî li dewera rojava girte destê xwe.

Bi kurtî wiha xûyaye hetanî destê derekî, bixasmanî destê Îranê nehê birîn, çareserî bo mesala gelê Felistînê eger nebêjîn çê nabe bigire gelek asteme.
Hemû însanekî aqil niha dizane ku asta hêza Îsraîl çendîn beranberê hêza vane. Min serî de îşare bi vê yekê kir ku salên 1960tan de hemû Ereban bi hemû hêzên eskeriye xwe nekarîne dewletwkî teze pêgehiştî, yan pêkhatî, niha piştî zêdetir ji 60 salan dê çavan bikarin wê dewletê bi rêkên şer têk bişkênin? Îsraîl niha digel Îsraîla wê demê gelek ferq dike, hêza eskerî li hemû hêzên Ereban û bi giştî hemû dewletên Rojhilata nawîn bi qawetire. Lê Îrana şerxaz û Îslamiyên tundajo ev yêke berçav negritin, yan Îranê ev kare wate êrîşe bi Hamadê kir, xwejî da paş. Ew qewlên ku Îranê dane Hmasê ku heger şer çê be, emê pişta we bigirin, hemû hêzên bisilmana pişta we dibin, her li rojên Ewilî derket ku hêzên bisilmanan tnê bi qise û gef xarin pişta Hemasê û Cîhada Îslamî ne. Şerê niha bi êhsas û gefan nabe, dibe bihêz be û bi kiryar bêne meydanê. weke dîyare Hemas kevte wê dawê. Îran neço nava şerî, welatên rojava, bixasmanî Amerîka bi hemû hêza xwe ve hatine pişta Îsraîlê girtin, Îran her ku ewe dît, her li roja duyê de rêberê tirsinoke rejîma Îranê hate pişt tirîbûnê û ragihand em têde nînin. Ewa ku hatiye kirin, gelê Felistînê tenê bi serê xwe kiriyê. Ez li ser vê baverê me hingê bû ku Hamas û Cîhada Îslamî li wê meydanê de mane tinê.

Alîyê Îsraîlî jî bi hizra min gelek li mêj bû ku li derfetekê digeriya ku tesfîye hisabekê tewî mesela Xezê û Hemasê bike. Lê derfet nebû bi raya gelek çawedêrên siyasî ku bi hizra min jî gelek li rastîyê nêzîke ewe ku Îsraîl mihtacê Hilûkastekî bu, ku meslê yêk sere bike, Hemasê û Îranê ew hêcete dane Îsraîl, îro rojê em dibînin ka çi tête serê gelê belengaze Felistînê. Bi gotineke dîke xwîn û malwêranî li Felistîniyan diçe û Îran dixaze bibe terefê kasibiyê.

Bo çî Îrna di cihê wê hindê ku biçe hevara Felistîniyan, tenê bi qise û hat û hûtê mezende dike? Bikiryar ti karekî dîke nake? Bi hizra min helwêsta welatên Rojavayî û bixasmanî Amerîka, rejîma Îranê zanî heger pêngavekê bihavêje, ewa hete serê Sedam Husêyn, dê bête serê van jî. Çimku Îran baş dizane ku nava gelên Îranê de ti cihpê û nifûsek nine. Eger tûşî şerekî mezin bibe, ne tenê gelên Îranê pişta wê nagirin, belkî, dê dijî wê jî raperin, Seba wê hindê tinê bi hat û hûtê dixaze bêje ku şer dê mezin be. Yan rojhilata nawîn bi hinek hêzên nîyabetiye xwe hinek teq û reqekê wê bikin, dê tewaw bibe, ti welatekî Îslamî li serveyî hemiyan jî Îran xwe têkelî wî şerî nakin. Heger Îsraîl û Amerîka ewî têkel nekin. Ya diyare ne Îsraîl û ne jî Ameirîk wê hindê naxazin.

Mixabin tenê xwîn û malvêranî û derbidrî bo gelê Felistînê dimîne. Felistîn dibe bixwe qirarên xwe bide, çavê van bi destê xelkê nebe, tenê ew dibe qazanic û berjewendiyên xwe biparêzin.



# Apartaîda zimanî li Îranê



**N: Dr.Mecîd Heqî**




Bûdceya geşepêdana zimanê Farisî li Îranê di sala 2022 de, nêzîkî 57 milyar tûmen bû. Îran ji bo çêkirina her peyveke farisî 11 milyon tûmen xerc dike. Xamineyî rêberê Komara Îslamî ya Îranê di meha Hezîrana sala 2019`an de, bal kişand ser pêwîstiya parastina hêz û reseniya zimanê Farisî wekî "hêmaya nasnameya neteweyî ya Îranê". Mihemed Mehdî Îsmaîlî, wezîrê rewşenbîrî û îrşada îslamî, roja 11.6.2023 de, zêdekirina bûdceya çandî ji bo pêşxistina zimanê farisî yek ji karên sereke yên hikûmeta serokomariyê bi nav kir.

Di vê navberê de, zimanên din ên erdnîgariya siyasî ya Îranê, di nav de Turkiya Azerî, Kurdî, Turkmenî, Gîlekî, Erebî, Belûçî û zimanên din, ne tenê ji bo wan bûdce nehatiye diyarîkirin, lê çalakvanên çandî yên wan zimanan jî, ku bi dilxwaza xwe û bi xercê xwe ji bo wejandin û geşepêdana ziman û çanda dayka xwe xebatê dikin, ji aliyê rejîma Îranê ve tên girtin û cezayên giran li ser wan tên birîn. Mînaka vê yekê jî 5 sal cezayê girtinê yê mamosteya zimanê kurdî ya bi navê "Zara Mihemedî" ya sala 2019'an li bajarê Sinê ye. Niha bi dehan kes ji xebatkarên zimanên netewên bindest ên Iranê bi tawana perwerdekirina bi zimanê dayîkê di girtîgehên Komara Îslamî ya Îranê de ne.

Apartaîda zimanî, ku jê re glutophobia (glottophobia) jî tê gotin, reftarek neheq e ku li ser bikaranîna ziman û taybetmendiyên zimanekî li dijî zimanên din ava dibe. Ji bo mînak, zimanek di nav zimanan de ji hêla hikûmeta welatekê ve wekî zimanek "fermî" tête destnîşankirin, û yên ku zimanê wan ê ne "fermî" ye, bi awayek otomatîk li ser dewlemendî, perwerdehiyê, rewşa civakî û taybetmendiyên dine kesî wek devoka axivtinê tên darizandin û dibe sedema cudakariyê. Nivîskar û ziman nasê Fînlandî xanim "Tove Skutnabb-Kangas" li naverasta salên 1980 an de apartaîda zimanî bi cudahiya di navbera zimanên netewan de pênase kir, ku tê de "îdeolojî û pêkhate" ji bo rewakirin, afirandin û jev weqetandina dabeşkirinê" were pênase kirin. Cudabûna zimanî yek ji nîşaneyên eşkere yên cudakariya apartaîdê ya civakî û çandî ye li ser milê neteweya desthilatdar.

Hilbijartina zimanê Farisî wek zimanê "fermî" yan zimanê serdest li Îranê de, ne tenê bûye sedema lihevhatina neteweyên îranî, belkî di warê geşepêdana çandî, civakî û aborî ya navçeyên neteweyî de jî bûye sedema cudahiyê. Zimanê farisî wek zimanekî kolonî di nav miletên din de, erdnîgariya Îranê tê dîtin. Zimanê kolonî ku tenê ji bo berjewendiya elîtan bû û girêdayî hikûmetê bû û zirarê dide piraniya xelkê ne Faris. Her çend zimanê farisî zimanekî xweş û dewlemend be jî, lê ne zimanekî bêalî ye, ji ber ku bi bikaranîna têçu û nirxên çandî tenê zimanekî hewl daye ziman, çand û nirxên din ji holê rake û piraniya caran jî li ser nirxên kor in û çarçêveyên referansê yên xwerû yên ku ji hêla çanda farisî ve hatine çêkirin.

Tiştekî xwezayî ye ku mirov bixwaze bibe endamê civakekê. Yek ji rêyên vê yekê jî endambûna komên civakî û zimanî ye. Digel ku hin kom dikarin bi hêsanî bala hikûmet û sermayeya dewletê ji xwe re veqetîne, ji hêla din ve komên din ên wekî komên neteweyî, etnîkî û zimanî ne tenê bala hikûmeta navendî nayên girtin, lê avakirina van komên din dibe sedem ku ji aliyê hikûmeta navendî ve bên cudakirin û tehdîdkirin. Zimanzanê Amerîkayî "Carmen Fought" li ser vê baverê bû ku mirov çawa ziman bikar tîne, dibe ku rê bide kesek din ku wan di komek civakî ya taybetî de dabeş bike. Wek mînak, li Îranê, li gor perspektîfa farisîaxêvan, kesên ku bi zimanê Kurdî yan Turkî diaxivin, kêm jîr û kulturî ne û girêdayî Tehranê yan jî nawçeyên navendî yên bi zimanê farisî wek serdestî dihatin pênase kirin. Zimanên ne Farisî ji aliyê neteweperestiyê ve bûne pira pêşdaraziya neteweyên ne Faris.

Kolonîzasyona zimanî bandoreke wêranker li ser kevneşopî, çand û nirxên civakên ne Farisî kiriye. Gelên ne Fars, ji ber ku ziman û çanda wan ji aliyê dewleta navendî ve nayê astengkirin, zimanê farisî ji bo têkiliyên bazirganî, îdarî û hiqûqî bi kar naynin û zimanên din di bin tehdîdê de ne. Kolonîzasyona zimanî bi bazirganiyê û bi fîlm û qirkirina çandî civakên ne Farisî wêran dike. Bikaranîna zimanê Farisî di perwerde, bazirganî û pîşesaziyê de yek ji siyasetên hikûmeta navendî ya Îranê ye ji bo guhertin û jinavbirina çand û zimanên din li Îranê. lawazbûna çanda yekane ya van neteweyan bi êrîşa çandî bûye sedem ku gelên nawçeyên ne farisî nikaribin bi hev re ji bo geşepêdana herêmên xwe kar bikin û ev yek bûye çekek di destê desthilatdarên Îranê de ji bo polarîzekirina gelên herêmê. Kolonyalîzma Farisî li dijî netewên ne Fars, berevajî kolonyalîzma welatên wek Îngilîstan û welatên kolonyalîst ên rojavayî, ne tenê talankirina samanên bin erdê yên herêmên ne Fars e, belkî xaleke din a dewleta Îranê jî hewla jinavbirina nefermî ye. Zimanê farisî bi awayekî bûye cudahiya çînayetî, Heger zimanê wî yê dayikê farisî be, ji aliyê sinifê ve, ji yekî ne Farisî çêtir e.

Gelek teoriyên post-kolonyal li ser têkiliya di navbera cudakariya ziman û zordestiya li ser çandên neteweyên din lêkolîn kirine. Nivîskarê navdar ê Kenyayî "Ngugi wa Thiong'o" di pirtûka xwe ya Dekolonîzekirina Hişê de dibêje ku ziman hem navgînek ragihandinê ye û hem jî hilgirê çandê ye. Di encamê de cudakariya zimanî ya ku ji ber kolonyalîzmê derkevtiye holê rakirina dîrok û nasnameyên beriya kolonyalîzmê hêsan kiriye. Di pirtûka Decolonizing the Mind de, wekî mînakek koleyên Afrîqayî tê gotin ku bikaranîna zimanê dayikê qedexe bû. Ev bû sedema qutbûna ziman û çanda di navbera koleyan û Afrîqayê de. Em heman nîşanan li Tehran û bajarên mezin ên navenda Îranê di nav zarokên malbatên ne faris de dibînin, ku bi derbasbûna demê re ne tenê zimanê dayika xwe ji bîr kirine, belkî ji çanda xwe ya netewî û xwemalî jî dûr ketine.

Cudahiya zimanî bi gelemperî bi perwerdehiyê tê hilberandin. Li herêmên ne farisî, ji ber biyanîbûna zimanê farisî di destpêka xwendina zarokên dibistana seretayî de, zarokên nefaris hêdî hêdî fêr dibin û di encama vê cudahiyê de bi herêmên farisîaxêv re, kalîteya xwendinê ber bi başbûnê ve diçe. Siyasetek nerm di fetisandin û kolonîkirina zimanên din de.

Her çend serweriya zimanê kolonî ji bo gelên ne Farisî derfetên aborî baştir peyda bike jî, Peymana Mafên

Dom R:5

Doma R:4

Zarokan a Neteweyên Yekbûyî tekez dike ku mafê zarokan heye ku zimanê xwe bikar bînin. Tepeserkirina zimanên ne Farisî di sîstema perwerdeyê ya Îranê de berevajî vê peymanê ye ku Îranê jî îmze kiriye. Herwiha zarokên ku ji zarokatiya xwe ve neçar dimînin bi zimanekî biyanî bixwînin, rastî ziyanan tên û dibin sedem ku rêjeya nexwendewariya giştî bilind bibe. Wek mînak dema Firansiyan jî wek rejîma navendî ya Îranê ji bo "şaristaniyê" li Cezayîrê bûn, zimanê firansî li ser Cezayîrî ferz kirin. Di wê demê de rêjeya xwendin û nivîsandinê li Cezayîrê ji %40 zêdetir bû û piştî hatina Firansiyan ta ku di sala 1962an de ji Cezayîrê derketin, rêjeya xwendinê li Cezayîrê herî baş %10-15 bû.
Li herêmên ne Farisî, zimanê Farisî wek zimanê dewletî û bazirganiyê tê bikaranîn, wek zimanê farisî, wek zimanên kolonî. Li gor yasayên Komara Îslamî jî, kesên ne Fars dikarin mafê dengdanê bo karbidestên hikûmetê wek encûmenên bajaran, parêzgehan û heta Encumena Îslamî jî hebin. Lê hema hema her tim rastî rûreşiyê tên, ji ber ku zimanê farisî baş nizanin, şansê wan kêm e ku bigehne post û pileyeke bilind a hikûmetê. Her wiha ev jî dibe sedem ku gel nikaribin pirsgirêkên xwe yên yasayî û îdarî bi zimanê xwe yê zikmakî çareser bikin û ev jî dibe sedem ku xelk ji bo çûyîna saziyên giştî û hikûmetê rastî astengiyên cidî bên.

Polîtîkayên zimanî yên hikûmeta navendî ya Îranê dibe sedema cudahiya zimanî, ku di nav xwe de reftarên rastîn ên mirovan li ser bikaranîna ziman vedihewîne. Li Îranê di warê kar, bazargeh û pergalên perwerdehiyê de gelek mînak têne dîtin. Bo nimûne, di polan de, mamoste bi pratîkî xwendekaran neçar dikin ku zimanê Farisî bikar bînin. Ziman û zaravayê kesên ne Faris yek ji faktorên cudabûnê ye û çavkaniya gelek pirsgirêkan di jiyana aborî û civakî ya gelê nefaris de ye.
Encama van polîtîkayan metirsiya tunekirin an jî tunekirina zimanên ne farisî ye. Veqetandina bûdceya zimanê Farisî ji bo zimanên ne Farisî û neteweyên ne Fars metirsî ye. Ev dagîrkariya çandî bûye sedem ku zimanên din jî bikevin bin bandora farisî û bi farisî re wek nimûneya zimanê gelêrî yê axivtinê tevbigerin. Di demeke dirêj de ev yek bûye sedema jihevketina zimanan heta radeyekê ku zimanên din di bin bandora farisî de neyên naskirin.

Ji bo Kurdan, Tirkan, Ereban û hwd zimanên wan parçewyekî bingehîn ê nasnameya wan a berê û îro ye. Tenê guhertineke bingehîn di siyaseta ziman de û pêşkevtina wekhev a zimanên ne farisî dê lihevhatina netewî û hesta "îranîbûnê" çêbike da ku em bi ziman û çandên cuda hêviya pêşerojeke hevbeş û demokratîk bikin. Nexwe rizgarkirin û azadkirina netewên bindest ji parastina her çarçêweya erdnîgarî û rengên alê çêtir e.





# Serdana serkomarê tawankarê rejîma cinayetkar bo Kurdistanê



N: Elî Munezemî




Îbrahîm Reîsî yê tawankar û serkomrê rejîma kevneperest, otorîtera serdema sedsalên navîn, dîktator, reşker, kaotîk, terorîst, derevker, hîlebaz, dijî aşitî û azadîyê- anku rejîma dijî merivahiya Îslamî a Îranê- di rêkevta 2ê çirriya paşîn a 2023an a zayînî de, serdana parêzgeha Sinê li Rojhilatê Kurdistanê de kir. Ev serdana li dema niha de ku Îran kevtiye ber gefa xelkê li hundir û li ber gefa Îrasîl bi sedema şerê Îsraîl û Hemasê, girîngiyek xasmanî û taybet heye. Li ber ku Îran hertim çavê wê li ser Kurdistanê ye û Kurdistan di warê ewlekarî de hereşeyek mezin e li ser rejîma Îslamî a Îranê. Tawankar Reîsî û mediayên hikûmeta melayan derheq wê serdanê gelek tişt gotin ku meriv dikare armancên girîn yên Reîsî di wan xalan de bibîne:

1- Bi xelkê bidin qebûl kirin ku êdî şoreşa azadîxwazî û rizgarîker a hêz û hereketên kurdî nemaye.

2- Bide selimandin ku şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" jî armanca dijminan û xêrnexwazan bû û êdî ev jî hatiye fetisandin û xelas bûye.

3- Genc û lavên kurd bixapînin û dilê wan xweş bike û bikşîne bo aliyê rejîmê.

4- Carek din bêje xelkê ku eger Kurdistan heta niha pêş nekevtibe, li ber nebûna ewlehî û aramîyê bûye û li wir şûn de çavnihêrê pêşkevtina Kurdistanê bin.

5- Bi întelektuelê kurd bide selimandin ku ne hêjaye çavê wan li pêşkevtin û rewşa Başûr be. Tixûbên kultûrî nabe bibin gef û hereşe li ser desthilatdarî û dagîrkariya Îranê li Rojhilatê.

6- Bide selimandin ku girêdana aborî û peywendiyên parêzgeha Sinê bi bajarên din yên Îranê ve yê bibe sedemê pêşkevtinê.

7- Bide selimandin ku balafirgeha Seqizê, balafirgehel medenî e bo xizmet bi xelkê û girêdayî bi pîlanên leşkerî û dagîrkarî ve nîn e û dibe berfireh bikin.

Ewan armancên Reîsî û hemû armanc û pîlanên dagîrkeran dizivirin ser wê hindê ku ne ewan baverî bi kurdan heye û ne jî kurdan baverî bi dagîrkerên Îranî heye. Bes eger wisa ye, mirov dikare bi hêsanî hemû wan armancên tawankar Reîsî di xalekê de kurt bike ku ev jî ewaye ku bide selimandin Kurd û Kurdistan hindî hebin, nikarin xwe xelas bikin. Yanî armanc çandina tovê bêhêvîtîyê bû. Yanî eger kurd dev ji armanca azadî û rizgariyê berdin, rejîma Îranê dikare alîkar be bo ku Kurdistan wek parek li Îranê pêş bikeve. Tawankar Reîsî dixwaze ku kurd bi havêtin û dev berdan ji armanca xwe û li egera nemana armancê de, xwe azad hîs bikin. Gava armanc nebe, ti astengî jî li ser riya wê nînin. Li ber hindê jî mirov dikare xwe azad bihesibîne. Yanî eger kurd dev ji armanca azadiya xwe û Kurdistanê berdin û xwe Îranî hîs bikin, hingê ne hîs dikin ku ziman, çand, nasname û … ya wan qedexe ye, ne mafê wan yê çarenivîsê hatiye zeft kirin û ne jî li neteweya dagîrker kêmtir azad û serbest in. Li ber ku dibin parek ji neteweya dagîrker û di nava wan de dihelin.

Reîsî ewê armancê jî wek minetekê bi kurdan bike, bo wan zelal dike. Yanî piştî kêmrengbûna şoreşa «Jin, Jiyan, Azadî» û wê davîyê jî bi givaş xistina ser pêşmergeyên Kurdistanê, Reîsî dixwaze xwe wek generalek serkevtî û neteweya kurd jî wek hêzek şikestî bîde xûya. Lê rastî tiştek din e. Hem Reîsî û hem jî karbidestên Îranê baş agehdarin ku hêz û hereketa azadîxwazî di Rojhilata Kurdistanê de li hemû parên din yên Îranê bêhtir bi organîze û rêberî ye û xelkê kurd jî ji hemû neteweyek din bêhtir hazirîya wan hember rejîma Îranê de heye. Niha jî ku gef û şerê derekî jî derî li wan girtîye û îhtimala lêdana Îranê ji aliyê Îsraîlê ji her demekê zêdetir e, dixwazin kurdan hem li bêhêvîtiyê de bihêlin û hem jî nasname û şonasxwaziya wan lawaz û jar bikin û bi girêdana wan bi Îraniyan ve, carek din li derkevtina her egerekê de, kurd nekaribin xwe rizgar bikin.

Bo ku rejîm bikaribe li wan pîlanên xwe de serkevtî be, Reîsî 2 girûpên sereke civandin ku ewan baştir bêxe xizmeta rejîmê: malbatên kuştiyên rejîmê û genc û xwendekarên nêzîk li rejîmê ku ev bi êlît navê wan dibe. Dixwaze ku ev êlît bi karê kultûrî, nirx û qîmetên rejîmê li Kurdistanê de bilav bikin û bi xurtkirina nirxên kultûrî yên rejîmê, nehêlin nirx û qîmetên kurdî yên bi xasma li parên din yên Kurdistanê şên û geş dibin, bêne nava Rojhilatê Kurdistanê. Li ber ku ev yeka dibe sedemê pêkve girêdana kurdan û Kurdistanê û çêbûna tehlîkeye bo rejîma melayan û dagîrkerên Îranê.

Rejîm bo evê ku bikare kurdan ji hev weqetîne û nehêle peywendiyên navbera kurdên Rojhilat bi hevre yan bi kurdên Başûr re xweş û xurt bibe, bas li kişandina xetê şemendeferê bo Sine û girêdana bajarê Sinê bi Hemedanê ve dike ku bi wî awayî bazirganî û peywendiya Kurdan bi Îraniyan re xurt be û kurd nekarin bibin xwediyê peywendî û aborîya hevpar. Ev pîlana bi dijî nasyonalîzma kurdî bi pîlan û bernameyên dem dirêj dikare xeterek mezin be li ser baverî û armancên me yên netewî.

Her çend ku kurdan bi giştî û xelkê neteweperwer û welathez yê parêzgeha Sinê baş li wan pîlan û fêlbaziya rejîmê agehdar in, lê dibe êlît û hêz û hereketên kurdî derheq vê yekê bêxem nebin.

## Nerîna Lîderan



**“Annalena Baerbock”:**

“Ji destpêka şerê Îsraîl û Filistînê heta niha 200 Almanî tevî endamên malbatên xwe ji Xezeyê derketine”




**“Benjamin Netanyahu”:**

“Em ê asayişa Xezeyê dabîn bikin. Me berê ew kare nekir û we dît ku çi qewimî”.



**“Sabrina Singh” :**

“Binkeyên Amerîkayê yên li Iraq û Sûriyê 40 caran bûne armanc”.



**“Omer Bolat”**
“Bazirganiya me bi Îsraîlê re ji sedî 50 kêm bûye”.

# Terorîzm nasnameya rejîma Axûndî di Îranê de



**N. Hûmen Simko**



Ji sala 1979’an û vir ve ku Şoreşa gelan li Îranê de bi awayekî ji aliyê axundan ve ji rê hate derxistin û dizînê, bingeha rejîmeke radîkal û binav îslamî li ser xelkê Îranê de hate sepandin. Ji destpêka desthilatdariya vê rejîma çewtekar ve li jêr navê ol, sîstemeke bi sam a dîktarorî, teror û kuştina cudabîr û rexnegiran dest pêkir û piştre bi cudaxwaz xwendina hêzên azadîxwaz ên netewên din li Îranê û ragihandina cehadê bi dijî gelê Kurd, dest bi cinayetên xwe li dijî netewên li Îranê de kir.

Kuştina rexnegiran û bi taybet terorkirin û kuştina kesên azadîxwaz ên endamên partiyên dijber an opozîsiyonê, rêkxistinên siyasî û komên neteweyên ne-Fars, bû nasnama vê rejîmê. Helbet ev kiryarên rejîmê, ji destpêka sepîna rejîma Îslamî li ser xelkê Îranê heta niha jî berdewam e û kuştin, binçavkirin, sepandina cezayên giran bi ser girtiyan, terora dijberan li derveyî Îranê, girtina bê belge û girtinên bi kom, sepandina cezayên giran û wergirtina îtirafa bi zorê li jêr îşkencekirinên hovane û kuştinên bi kom hêj ji aliyê rejîma Îranê ve li ber çavên cîhaniyan têne kirin û ev yeka bûye nasnameya neguher a rejîma Axûndî.

Ew sîma, rûk û binyata rejîmê bi wî awayî ku hemû binyat û bingeha hizrî û felsefeya kawilker a rejîmê, li asta cîhanê wek nasnameyekê bo rejîma Îranê tê dîtin.

Desthilatdariya rejîmê bi serokatiya dîktatorekî dûr ji hemû biryar û pirensîpên exlaqî û miroivî û bi nav olî û qorixkirina tewaw a desthilatê û bêparkirina hemû kes û aliyan ji birêveberiyê, ji aliyê rejîma Îranê li dijî binyatên hizrî û pêwerên cuda yên weke welatên Rojava li warên cur bi cur ên perwerde, teknolojî, civakî û siyasî de tê dîtin û rejîma Îranê felsefeya hebûn û mana xwe li ser dijayetîkirin digel wan nirx û bihayên rojavayî dibîne.

Piştî herifîna rejîma Pehlewî li Îranê, Artêşa Îranê ku yekem hêza parastina Îranê li hember heçî gefekî derekî bo ser welat bû, kevte jêr bandora hejmoniya rejîmê, lê bi qasa hewce timakariyên rejîmê û zêdexwaziya desthilatê têra nedikir, bi vê sedemê bi awayekî paralêl hêzeke bi tewaw daxistî û radîkal û bi tewaw li jêr fermana rêberiya rejîmê bi navê spaha pasdaran hate avakirin û spah bû stûna duyemîn a desthilatdariya rejîmê û piştre bû hêza yekem a leşkerî li Îranê ku bi hemû awayek li xizmeta siyaseta rejîmê û fetisandina dengê neraziyan de hate bikaranîn û li cîhanê de hemû hizrên kavilker û terorîstî yên bingehîn ên rejîma îranê bi rêya spaha quds û girûpên terorîstî an tundajo bo encamdana pîlanên xwe yên qirêj bi kar tîne û geşê bi terorîzma navdewletî dide.

Ji destpêka desthilatdariya rejîmê li Îranê heya îro, kiryarên rejîma axûndî li ser tabloya belavokan û karnameya vê rejîma terorîstî, têne dîtin û dujminatiya eşkere ya rejîmê digel neteweyên din ên Îranê nîşan dide. Li çendîn tevgerên netewî de, bi taybetî di şoreşa Jînayê de, destên bi xwîn ên rejîma axûndî li kuştina bi hezaran jin û zarokên Îranê tê dîtin.

Rejîma Îranê desthilata xwe wisa pênase dike ku hukm û rewayî ya xwe ji aliyê Xwedê ve werdigre ku li ser gelên Îranê hukim bike û vê desthilatê li ser 4 aliyên cîhanê de berfireh bike û tevahiya cîhanê bêxe jêr desthilatdariya xwe ku xwe bi nûnerê Xwedê dizane û ti rexneyekê jî ji tu aliyekê ve qebûl nake.

Bi gotinek din ev rêberê rejîmê xwe bi nûnerê Xwedê li ser erdê dizane. Nasname û çanda çend hezar salaneya gelan li Îranê bi dujminê xwe dizane û heta hewla jinavbirina şûnwarên dîrokî jî didin û dujminê hemû aştî û azadiyeke mirovî li cîhanê de ye.

Li vê navberê de kurdên ku heşîmeteke mezine pitir ji 15 milyonî li Îranê de heye, di van 45 salan de li hemû waran de bêpar mane. Helbet bes e ku mirov bibêje di van 45 salan de Kurd li ti warekî siyasî, civakî û çandî de nebûne xwedî maf û heçî cure xebatekî Kurdan li Îranê de wek kiryar û tevger an jî aliyek siyasî û opozisyon û dijî rejîmê hatiye hesibandin û bi awayê herî tund rastî sizadanê bûye. Mafê ti rêkxistin, kom an kesayetiyeke netewî ya gelê Kurd nîne ku beşdarî ti meydaneke siyasî li Îranê de bike û ti pile û postekî bilinde deshilatê werbigire, Ji ber ku Kurd di siyaseta rejîma axundî de bi dijeşoreş anku “ziddê Inqilab” tê binavkirin.

Fermana cehadê bi dijî Kurdan, kuştin û terorkirina xebatkar û rêberên Kurdan, terora fizîkî ya azadixwazan û kesayetiyên navdar li “Kurdistan, Belûçistan, Azerbaycan, Tirkemen Sehra, Xûzistan” û kêmîneyên olî yên wek, “Sunnî, Behayî, Ehlê Heq, Kirîstiyan û kêmîneyên din”, rûyeke din a nasnameya rejîma Îranê ye.

# Şerê Xezeyê: Hamas yekem, Hizbullah dûyem



**N: Ebdulezîz Qasim**



Wisa diyar dibe ku hîç sînorek yan demekî destnîşankirî bo rawestandina oparsyona leşkerî ya Îsraîlê li ser Xezayê nîne, piştî êrîşa ji nişka ve ya Hemasê li ser Îsraîlê di 7ê Cotmehê de û kuştin û revandina xelkê sivîl yê Îsraîlê, bi taybetî piştî zêdebûna êrîşên Hemasê yên (bi mûşekan) di van salên dawiyê de li ser Îsraîlê, lê xala herî girîng û balkêş ya di êrîşa 7ê Cotmehê (7ê Oktober) ku Îran û Hizbullah li pişt vê êrîşê ne, û li gorî boçûna hindek şirovekarên siyasî, ku Îranê dest ji Hemasê berda piştî rawestandina Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi awayekî rasterast li tenişt Îsraîlê.

Berî çend rojan, di gotarekê de li ser navê (Şerê Xezeyê ber bi kûve diçe), min diyar kiribû ku bi sedema êrîşa 7ê Cotmehê, dê aloziyek mezin peyda bibe û dibe ev şer ber bi navçeyên din û herwiha ber bi arasteyên din jî belav bibe, nameze ku bi awayekî rasterast, pêvajoya asayîkirin û aştiyê di navbera Erebistana Siûdî û Îsraîlê de hate armanckirin, bû sedemê rawrstandina pêvajoya navhatî bo demekî nediyar, ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi salan kar li ser pêkanîna vê pêvajoyê dike, ji bo peydakirina aştiyê li navçeyê, bi taybetî di navbera Filistîniyan û Îsraîlê de, ku her ji serdemê Serokê Amerîka yê berê Donald Tiramp ve kar ji bo vê yekê dike bi navê Peymana sedsaliyê (Deal of the century) ku ev nav ji sernavê fîlmekî komedî yê sala 1983an hatiye wergirtin.

Li gorî ku (her tişt li siyasetê dibe), dibe ku operasyona leşkerî ya ku niha li Xezayê berdewam, dibe ku bi rengekî ji rengan, gavên bilez ber bi pêkanîna pêvajoya aştiyê di navbera Ereban û Îsraîliyan de, ku dibe Ereb û Filistînî vê yekê qebûl bikin, bi taybetî piştî piştevaniya mezin ya Amerîkî û Ewropî ji Îsraîl re. Lê bi dîtina min di şert û mercên niha de hêj dema vê nehatiye, bi kêmanî ku hêj Hemas û Hizibullah dibin metirsiyek berdewam li ser her pêvajoyek aştiyê, lewra dibe ku danûstandinên aştiyê bimînin bo piştî ji navbirina Hemas û lêdana Hizibulahê, nemaze ku wisa diyar dibe ku ji navbirina Hemasê tiştek hêsan nîne û dibe oparsyonên leşkerî bi çend mehên din li ser Hemas berdewam bikin. Tevî ku Amerîka niha kar dike ji bo şer ber bi navçeyên din neçe bi taybetî ber bi Lubnanê, lê roj bi rojê wisa diyar dibe ku Hizibullah dê bibe dûyem armanc bo şerê Xezeyê, bi taybetî piştî êrîşên Hizibullahê û gefên Hesen Nesirullah rêberê wê li ser Îsraîlê, ku niha metirsiyek mezin li Lubnanê peyda bûye.

Piştî êrîşên Hizibullah li ser sînorê bakûr yê Îsraîlê, helbet wê ew êrîş bê bersiv nemînin, û dê Îsraîl bersiva wan êrîşan bide ku dibe Ereb bi giştî yan jî Erebistana Siûdî bi taybetî jî razî bibe li ser şerê Xezeyê û ji navbirina Hemas beramber ji navbirina Hizibullah û Hosiyan û hemû dar û destekên Îranê li nav welatên Erebî, lewra pêvajoya aştiyê dê carek din berdewam bike piştî têkşikandina hêza Hizibullahê li Lubnan û Sûriyê, û dûr nîne ev şer ber bi navçeyên din û herwiha ber bi arasteyên din biçe, ku gelek dergehên şer û herwisa yên aştiyê jî li pêş wî şerî wekirîne, hevdem wekî tê ragihandn ku heta niha Amerîka razî nîne û naxwaze ev şer ber bi navçeyek din belav bibe, lê Îsraîl mukure li ser têkşikandina Hemasê bi yekcarî, herwisa dibîne ku her serkevtinek li Xeze bi tenê, dê seqet bimîne bê têkşikandina hêza Hizibullahê jî, tevî metirsiya berdewm ya çekên nukleerî yên Îranê bi awayekî hevbeş li ser Îsraîlê û dewletên Erebî yên hevalbendên Amerîkayê.



# Rêkxistina bêrûmetkirina mirovan



N: Serbest Urmiye






Mafên mirovan hêdî hêdî yê dibe çîrokeke tal ya dîrokê. Piştî Şerê Duyemîn yê Cîhanê, welatên endam di NY'ê de biryar dan ku mirov bi hev re di cîhanek wekehev de bijîn û di 10'ê meha Kanûnê a sala 1948'an a Zayînî de, Danezana "biryarnama" Mafên Mirovan ji bo jiyanek baştir hate pejirandin û îlankirin.

Danezana han destpêkek û 30 madde hene, ku naveroka vê şiroveya parastina mafên mirovan û wekheviyê di civaka mirovahiyê de dike. Piraniya welatên cîhanê û yek ji wan Îranê jî ev Danezan pejirandiye û li gor vê yekê dibe ku rejîma Komara Îslamî ya Îranê jî parêzerê mafên mirovan be. Lê rastiya tal a dîrokê ji vir dest pê dike, dema ku mafên mirovahî dibe goriyê siyasetê.

Rejîma Îslamî ya Îranê bi eşkere hewil dide ku bi tepeserkirina neteweyên niştecihên Îranê û bêparkirina wan ji azadiyê di tev aliyên jiyanê de, ummeta yekgirtî ya îslamî ku di baveriya wan de bi ummeta olparêz a şî'ie tê şirovekirin ava bike. Ji ber vê yekê jî hemû dezgehên leşkerî û hêzên ewlekarî yên xwe erkdar kirine ku destan ji ti tawanekê li dijî civaka mirovahiyê û bitaybetî li dijî azadîxwazên civakê neparêze. Ji bilî akincihên Îranê, hewlên rejîmê bo berfirehtirkirina îdeolojiya ummeta Îslamî, sînorên herêmê jî tevlîhevkirine û di hemû welatên derdorê xwe de jî bi terzekê dest bi ser jiyan û azadiya xelkê de girtiye û bi damezirandin û bihêzkirina bi dehan taqim û hêzên şerxwaz berdewam netenê gefê ji mirovahiyê dike, belkû rewşeke pir metirsîdar bi ser mirovên herêmê de sepandiye. Lê serbarê van hemû rastiyan jî, Rêxistina Cîhanî ya Mafên mirovan bi çavên girêdayî yan renge mirov bikare bibêje ku bi zanebûn di kiriyareke xweser de, balyozê Komara Îslamî ya Îranê wek berpirsê konseya civakî ya vê rêkxistinê destnîşan kir.

Dema ku tê gotin di kiriyareke xweser de, ji ber vê ye ku serbarê vê yekê ku gellek çalakvanên mafên mirovan û yek ji wan Hillel Noir, parêzerê navneteweyî yê mafên mirovan û rêveberê desteya kargêrî yê Rêkxistina Çavdêriya NY'ê di warê mafên mirovan de, ev yek şermezar kir û da zanîn ku ew kiriyara han tê wateya bêrûmetkirina hezaran kesan ku bûne qurbaniyên tundûtûjî, lêdan, eşkence, destdirêjiya zayendî û kuştinê ji aliyê rejîma Komara Îslamî ve. Navhatî her wiha çalakiyeke mezin li dijî biriyara Rêkxistina Cîhanî ya Mafên Mirovan lidarxist û daxwaz ji "Antonio Guterres" Sekreterê Giştî yê NY'ê kir ku biryara han ret bike. Lê bê encam ma.


Zelal e ku di cîhanê de hewlek heye ku mirovahiyê bike goriyê siyasetê. Eva ne gerra yekemîn e ku rêkxistina NY'ê û Mafên Mirovan hewil dane ku mirovên ku di çarçoveya Îranê de niştecî ne, bêrûmet bikin. Ji ber ku eva ne cara yekemîn e ku rejîma Îranê di asta cîhanî de endametî yan serokatiya sazî yan rêkxistineke cîhanyî ya girêdayî bi NY'ê wergire. Di sala 2021'an de jî, ji aliyê welatên endamên yên NY'ê ve, rejîma Îranê weke endam di Komîsyona "Rewşa Jinan" de hate hilbijartin. Herçend ku piştî ku Komara Îslamî bi tundî dest havête tepeserkirina xwepêşandanan, nemaze di serhildana " Jin, Jiyan, Azadî"yê de, ji ber pabendnebûna rejîmê û pêpeskirina eşkere ya mafên jinan, rejîm ji endamtiya vê komîsyonê hat dûrxistin. Serbarê vê hindê jî, di dema ku kuştin û serkutkirina xelkê nerazî di Îranê de di asta cîhanî de dengveda, civata Mafên Mirovan ji bo lêkolînê û bidestxistina rastiyan komîteyeke taybetû destnîşan kir ku heya îro jî rejîmê rê nedaye komîteya han ku çi zaniyariyên zelal di vê derheqê de bidestvebîne .

Eşkere ye ku Rêxistina Cîhanî ya Mafên Mirovan divêt ku heyamekê bi çavên girêdayî karê xwe bidomîne, da ku neçar nemîne ku bizane li çarçoveya cografiya Îranê de , mirov dibin goriyê siyasetên hovane yên rejîmekê ku derbasbûyeke xuya di înkarkirin û binpêkirina mafên mirovan de heye û heya niha bi dehan biriyarnameyên cîhanî derheq binpêkirina mafên mirovan de li dijî vê rejîmê hatine pesenkirin û tenê ew welatek e ku çawdêreke taybet jê re hatiye diyarî kirin da ku rewşa mafên mirovan li wî welatî de bişopîne.

# Celal Melekşa Xwediyê helbest û wêjeya berxwedanê



N: Nûredîn Sofîzade



Celal Melekşa Helbestvanê ku xema niştîman û netewa wî, giranî xistibû ser mila û di bin barê girane wê xemê de hemî jiyana wî dijvar û tal û bi azar û êş bû.

Helbetvan Celal Melekşa di sala 1951 an li gundê Melekşa girêdayî bi parêzgeha Sinê li Rojhilatê Kurdistanê ji dayîk bibû, ev helbestvanê netewî 3 salan berî niha koça dawî kir, wî gelek berhemên bi bandor û helbestên hestbizvên bo nivşên piştî xwe û gelê xwe yê bê maf bi cî hêlan.

Her bi hilkevta sêyemîn salvegera koça dawî a wî helbestvanê Kurd, komek evîndarên hizr û ramanên Melekşa, emegdar û hogirên helbestên wî, ji bona bilind ragirtina yadê wî, merasimek li Sinê de lidar xistin.
Di vê merasimê de Hunermend, Helbestvan, Nivîskar beşdar bûn û mijar û gotarên taybet bi vesfa wî helbestvanê mezine Rojhilatê Kurdistanê pêşkêş kirin.
Hervisa çen xortekî alîgir û evîndarên helbest û edebiyata Celal Melekşa, li vê merasimê de hin helbestên wî yên bijarde xwendin.


Celal Melekşa, ku bi sedema helbestên netewiye xwe ve li Rojhilatê Kurdistan û perçên dinê ye Kurdistanê hatibû naskirin, pitir ji 40 salan rolekî mezin li dewlemendkirina vêje û zimanê Kurdî de hebû û gelek bandor li ser hogirên edebiyat û helbesta Kurdî dana.

Melekşa yêk ji helbestvanê Kurd bû ku sebka helbestên wî de dengê berxwedaniyê û edebiyata xweragiyê û helbestên netewî û niştîmanî dihate bihîstin û sehkirin. Wî pitir ji 40 salan bo anîne zimana bê mafî, belengazî, bindestî, berxwedan, xwedî derkevtin ji nasname û çand û edebiyata Kurdî helbest vehunandin, her lewma li ser wî deng û pênûsa bivêre xwe gelek caran kevte ber azar û îşkence û girtin û givaşa dujminê dagîrker, lê ti givaş û hêzekî dujmin nekarî wî bêxe qedeman ku dev ji welatparêzî û hesta netewiye xwe bîne, belku hemî ev azar û îşkenceyên dujmin, dibûne hêz ku ziman û pênûsa wî bi gurtir û bivêrtir be.
Wi helbestvanê netewî, ji bilî vehunandina helbestên netewî, li çendîn govaran de jî gotar û helbest nivsîn û rolekî berçav li dewlemend kirina vêjeya Kurdî de hebû. Herwisa li bajarê Sinê de jî çend salan weke mamosta yê zimanê Kurdî wane got û dehan û belkî sedan lavên Kurd wek mamoste û bi helwest piştî xwe perwerde kirin ku li ser perwerdehiya zimanê Kurdî di nava Lav û Zarokên Kurdistanê de gelek bandor hebî.

Herwisa wî helbestvan û rewşenbîrê mezine Kurd, ji bilî helbest û nivsîna bi zimanê Kurdî, gelek berhem û helbest bi zimanê Farsî jî nivîsandine, û di nava rewşenbîr û nivîskarên Fars de jî navdengekî bilin û naskirî heye û peywendiyekî baş digel hunermend û helbestvan û nivîskarên Fars de hebû, lê piştî salê destpêka dehka 80 an a zayînî, biryarê dide ku hemî hêz û qelema xwe tenê bêxe xizmeta ziman û vêjeya Kurdî û êdî ji bilî nivsandina bi Kurdî, çiyê din bi zimanê Farsî nanivîse. Bo vê helwestê jî dest dike bi vehunandina komek helbes “Karesat” û “Zireyî zincîry wuşe dîlekan” ku herduk ev kome helbestane digel pêşwaziyekî mezin li Kurdistanê de hember dibin.

Hemî ev welatparêzî û helbestên berxwedanî û hesta netewiye wî bû ku heya îro jî dengê ziman û pênûs û helbestên wî, li ber guh û li ser zima û li hibra pênûsa xortên evîndarên Melekşa de zindîne, û em dibînin piştî derbasbûna 3 salan bi ser koça dawiya wî helbestvanê mezine Kurd de, li gund û zêdê wî de, dehan helbestvan û nivîskar û rewşenbîr û lavên evîndare hizra Melekşa kom dibin û yadê wî mezin û bilind radigrin û weke çavan Melekşa hebxwe digot, îro ev jî dibêjin: Ez helbestvanê nîştimanê xwîn û Çiya û Tifengê me.

Di dawiyê de tenê em dikarin bibêjin ku Celal Melekşa bi cism û laşê xwe yê lewaz, barê girane xema belengazî û bêmafiya gelê xwe danabû ser milê xwe û karî piştî xwe jî gelek rêvîngan û hilgirê wî barî perwerde bike û bihêle ku vê rêkê anku çepera çand û vêje û berxwedaniyê û çêkirina hesta netewî bidomînin.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Bonab; Berdewamiya binçavkirin û nexuyabûna çarenivîsa welatiyekî Kurd

Tevî ku 15 roj bi ser binçavkirina welatiyekî Kurd bi navê Hisên Paye kurê Ehmed xelkê Nexede û rûniştiyê bajarê Bonabê, heya niha ti zanyariyek li derheq çarenivîsa wî de nîne.

Li gor çavkaniyek agehdar, hêzên ewlehiyê 15 rojan beriya niha bêyî nîşandana belgeya dadgehê ev welatiyê han li bajarê Bonabê binçav kirine û heta niha jî şopandina malbata wî ji bo zanîna çarenivîsa kurê xwe bê encam bûye.

Vê çavkaniya haydar her wiha got: Hisên Payê ji mafê hebûna parêzer, peywendiyên telefonî û hevdîtina bi malbata xwe re hatiye bêparkirin.

Heya dema belavkirina vê nûçeyê, ti zanyariyek li derheq sebeba binçavkirin û tohmetbarkirina vî welatiyê Kurd tine.




## Li sînorê bajarê Merîwanê bi sebeba teqîna mînekê kolberek birîndar bû

Êvariya roja Şemî 13'ê Xezelwerê, xortek bi navê "Peyam Rizayî" kurê Celal xelkê gundê Pîle ya Merîwanê li sînorê vî bajarî bi sebeba teqîna mînekê bi giranî birîndar bû.

Li gor çavkaniya agehdar  ya Kurdpayê, ev kolber li sînorê "Savcî" ya ser bi Merîwanê di dema kolberiyê de, bi mînekê ketiye.

Vê çavkaniya agehdar zêde kir: Ev kolber di vê bûyerê de lingê wî birîndar bûye.

Peyam Rizayî ji bo çareseriya pizîşkî bo navendên pizîşkî hatiye veguhastin.



## Merîwan; Zana Pervane piştî danîna barimteyê bi awayekî demkî hat berdan

Roja Şemî 13'ê Xezelwerê, welatiyê Kurd yê xelkê Merîwanê Zana Pervane, piştî derbasbûna 2 meh û 15 rojan binçavkirinê, bi danîna barimteyê bi awayê demkî hat berdan.

Li gorî çavkaniyeke agehdar, ev welatiyê han di dema binçavkirinê de, ji mafê hebûna parêzer hatibû bêparkirin.

Ev welatiyê Merîwanî, roja Şemî 28'ê Gelawêja îsal, bêyî nîşandana belgeya dadgehê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatibû binçavkirin.
Heta niha li derheq sedema binçavkirinê û tohmetên li ser Zana Pervane de ti zanyariyên berfireh bi dest neketin.



# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (457)